

Berawirdkirina Destpêka Rojnamegerî û Edebiyata Modern a Kurdî û Tirkî

AHMET KAN

Kurte

Bi giştî rojnamegerî û berhemên edebî, ji mercên civakî, siyasî, çandî û dîrokî zerar an sîd werdigirin. Wek ku tê zanîn cihê destpêka rojnamegerî û edebiyata modern a Kurdî (kumancî) û Tirkî (Osmanî) paytexta dewleta Osmanî Stenbol bûye. Ji ber vê hevparîya cihê destpêka rojnamegerî û edebiyata modern a Kurdî û Tirkî berawirdkirina berhemên van her du zimanan (Tirkiya Osmanî ku zimanê desthilatdaran e û Kurdîya ku ji ber qedexeyan li sirgûnê dest bi weşanê kiriye) dê lêkolînek balkêş derbixe holê.

sereke: berawirdkirin, destpêk, rojnamegerî, edebiyata modern, Kurdî (kurmanci), Tirkî (osmanî), Stenbol.

Öz

Genel olarak gazetecilik modern edebiyatın oluşumunda olumlu rol oynamıştır. Gazetecilik ve modern edebiyat özellikle Avrupada (Batı ülkeleri) belli sosyal, politik, kültürel ve tarihi koşullar sonucu ortaya çıkmıştır. Osmanlı Türkçesi ve Kürtçe'nin Kurmancî lehçesine Osmanlı İmparatorluğunun başkenti İstanbul merkez olmuştur. Bu iki dildeki gazetecilik ve modern edebiyat oluşumunda devletin rolü farklı olmuştur. Bir tarafa devlet destek olurken diğerine yasaklarla engel olmaya çaba göstermiştir. Bu iki dildeki gazetecilik ve modern edebiyatlarının başlangıçlarını karşılaştırmak ilginç olacaktır.

Kelimeler: gazetecilik, modern edebiyat, karşılaştırma, Osmanlı Türkçesi, Kürtçenin Kurmancî lehçesi, İstanbul.

Abstract

In general, journalism played a positive role in the formation of modern literature. Journalism and modern literature emerged as a result of certain social, political, cultural and historical conditions, especially in Europe (Western countries). Istanbul, the capital of the Ottoman Empire, has been center Kurmanji dialect of Kurdish and Ottoman Turkish. The role of the state was different in the formation of journalism and modern literature in these two languages. While the state supported one side, it tried to prevent the other with bans. It will be interesting to compare the beginnings of journalism and modern literature in these two languages.

Keywords: compare, journalism, modern literature, Kurdish (Kurmanji), Ottoman Turkish

Destpêk

Di dîroka civakan da rola perwerde û zanîne ciheke girîng digire. Perwerde û zanîna civakî bi gelemperî li dibistanan tê dayîn. Di hin deman da zanîna ji dibistanan hatiye bidestxistin bi rêya çapemeniyê ji bo civatê ra tê pêşkêş kirin. Ji bo vê rolê li Ewropayê meriv dikare mîna ronansa ku di navbera sedsalên 15-16an da pêk hatiye, bide. Ev rewşenbîriya ku bi modernîteyê hatiye binavkirin pêl bi pêl li cîhanê belav bûye. (Kanî 2019:1)

Wek ku Amir Hassanpour (Emîr Hesenpûr) di pirtûka xwe ya bi navê “Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985/Li Kurdistanê Neteweperwerî û Ziman” da pêşkêş kiriye, gelek lêkolînerên ku li ser dîroka medyayê xebitîne geşedana neteweperweriyê û zimanê neteweyan bi teknolojiya çapxaneyê ve girêdane. (Hassanpour 2005:275) Di heman berhemê da Hassanpour balê dikişîne ser çewtîya girêdana geşedanê bes bi teknolojiya çapxaneyê ve û dinivîse ku di sedsala duyem a piştî zayîne da li Çînê çapxane hatiye îcadkirin (dahênan) (Hassanpour 2005:276).

Li virê mebesta me ew e ku em balê bikişînin ser atmosfera ku tê da modernîte ava bûye, ne bitenê teknoloji ye. gel teknolojiyê gelek mercên civakî, çandî û sîyasî jî pêwîst bûn. Di vî warî da Benedict Anderson di pirtûka xwe ya bi navê “Hayali Cemaatler Milliyetçiliğın Kökenleri ve Yayılması/Cema’etên Xeyalî” da wiha dinivîse: “Girîngîya vê guherîne ya bo peydabûna neteweyan wek cema’etek xeyalî, em dikarin bi lêkolîna du binyadên wek roman(wêje) û rojname, du şeweyên texeyulê ku cara yekem li Ewropayê, di sedsala 18an da derket holê, bibînin.” (Anderson 2017:39)

Neteweya ku wek cema’etek xeyalî hat pênasakirin, ev xeyal jî bi saya du çavkanîyên xeyalî ku ji rojname û pirtûkan (çîrok û roman) pêk hatîye, tê holê. Pevgirêdana esasî jî dîroka ku li ser rûpela pêşîn a rojnameyê wek amblem cih digre, pêk tîne. Çavkanîya duyem a pevgerêdana xeyalî ku wek şewaza pirtûkek pêwendîya rojnameyê û bazarê ye. Di çil salên navbera çapa cara pêşîn a Mizgînîya (Încîla) Gutenbergê û dawîya sedsala 15an da, yanî ji 1460î heta 1500î, tê texmîn kirin ku 20 milyon dane hatine berhemînan. Ev hejmar di navbera 1500 û 1600î da gihîştîye 150-200 milyonan. Êdî çapxaneyên ha ji karên dêran bêtir dişibîyan kargehên modern. Wek saziyên çapkirinê dixebitîn. Di wateyek taybet da be jî pirtûk berhema pêşîn a pîşesaziyê (sanayiyê) û xerîdarîyê bû ku bi awayek modern di pîvana girseyî da dihat hilberîn. (Anderson 2017:49)

Ev modernîte bi awayek rêk û pêk di qada çapemeniyê da li hemû Ewropayê belav bû. Wek ku Gregory Jusdanis di pirtûka xwe ya bi navê “Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür/Modernîteya Derengmayî” da dinivîse, “Çapemeniyê di serdema pêşîn a qada gelemperî (kamusal) ya Ewropayê da rolek girîng lîst. Çapemeniyê, di serî da bi awayê buroşur û rojnameyên wek pelek mezin bo gelempera ku ji bijîşk, efser, zanyar û hiqûqnasan pêk dihat û di geşedanê da bû, derbarê pirsgerêkên gelemperiyê da nûçe radigihandin. Nûçe radigihand merivên taybet (kesên di karîgeriyê da cih nagirin) ku bihatina berhev civatek gelemperî (kamusal) pêk dihanîn. Çapemenî zemîna perwerdeya gelemperîya rexneyî bû. Ji ber ku di serî da, di navbera rexneya edebî û rojnamegerîya sîyasî da ferqek girîng tunebû her du jî ketibûn xizmeta rewşenbîriya sîyasî. Di vê mijarê da Jusdanis ji Hohendahlî vê vediguhêze ku modela lîberal a rexneya edebiyatê, ji dema ku di sedsala 18an da derket holê ve, bi awayek jênegar bi qada gelemperî ya burcuvayê ve girêdayîbû. Bi rastî çarçoveya têgiha rexneya edebî, kategorîya qada gelemperî bi xwe afirandîye. (Jusdanis 1998:188-189)

Destpêka Rojnamegerî û Edebiyata Modern a Tirkî

Di navbera salên 1851 û 1885an da, edebiyata Tirkî, çi ji alîyê dîmena xwe ya derve be, çi jî bi îtîbara xwe ya binyadî ve be bê navber diguherî. Ji aliyê hêmanên (ûnsûrên) nû û minasebetan ve dewlemend dibû. Ev dewreke ku bi navberên deh-dozdeh salan raman bi pêş dikevin, meriv gelek diguherin. (Tanpınar 2018:250)

Rojnameya yekem a bi Tirkî Teqwîm-î Weqayî (1831) fermî bû. Ji xwe rêveberîya Dewleta Osmanî gelek hewl dabû, bi hin astengkirinan ku çapxane 250 sal dereng bigihîje nava Tirkên Osmanî. (Kaya 2010:13)

Cerîdeyî Hewadîs (1840) jî nîv fermî bû. Serdema van du rojnameyan wek serdema bervekirina meyla şaristanîya ewropî bû. Ev di rojnamegerîya Tirkî da dewra yekem e ku heta 1961ê didome. Dewra duyem a rojnamegerîya Tirkî bi rojnameya Tecuman-î Ahwal (1861) dest pê dike. Paşê şanoya Vatan yahut Silistre (1873), civata ku bi fermanan radibe û rûdinê, hinek bi rûyê jiyana rasteqîn û pirsgirêkan ra rû bi rû dike. Li dora têgehên wek welat, netewe, mirovatî, azadî, maf û dadê bawerîyek rastîn tê holê. Seîd Paşa bi navê “Zimanê Rojnameger” berhemek ku geşedana zimanê Tirkî vedibêje amade dike. Şînasî jî di beyannameya Tercumanê Ahwal da heman tiştî tîne ziman. Zimanê Tirkî bi piştgirîya desthilatê (padîşah), li derdora rojnameya navborî geşedanek bi hêz derdixê holê. (Tanpınar 2018:251)

Bi saya vê geşedanê edebiyata modern a Tirkî jî dertê holê. Di serî da wergera romanên wek Hejar (Sefiller), Robinson Cruzoe di rojnameyan da tînen tefrîqê kirin. Piştî van wergeran di sala 1870yê da çîrokên Ahmed Mîdhat Efendî bi navê “Kıssadan Hisse ve Letâif-i Rivâyât” dertên. *Müsâmeretnameya* Emin Nihat Beg a ku di navbera salên 1873-1875an da hat amadekirin berhema duyem e. (Tanpınar 2018:286)

Di sala 1875an da romana Şemsettin Samî ya bi navê “Taaşuk-ı Talât ve Fîtnat” der çû. Di 1876an da Namîk Kemal bi navê “İntibah” romanek nivîsî. Bi vî awayî rojnamegerî û edebiyata modern a Tirkî (Osmanî) dest bi geşedanê kir.

Destpêka Rojnamegerî û Edebiyata Modern a Kurdî

Rojnamegerîya Kurdî, li surgunê, li Qahîreya Misirê, roja 22yê Nîsana 1898an, bi navê rojnameya Kurdistanê dest pê dike. Ev roj (22yê Nîsanê) her sal wek roja rojnamegerîya kurdî tê pîroz kirin. Îsal 123 salîya derketina rojnameya Kurdistanê ye. Ji xwe kurdan ji ber asteng û qedexeyên dewleta Osmanî, 300 sal piştî destpêka rojnamegerîya cîhanê (Kaya 2010:13) rojnameya Kurdistanê derdixist. Bi tevî vê derengmayînê jî rêveberîya Siltan Evdilhemîdê Duyem, li ser derketina rojnameyê di cih da, berî jimara duyem derkeve, fermana qedexekirina anîna rojnameya Kurdistanê bo hemû bajarên dewleta Osmanî dide. (Malmîsanij 2011:121)

Zêdeyî 122 salan e ku kurd hatine nava cîhana rojnamegerîyê, ev ne kêma e. Heger ji sala 1898an û vir de, di nav qirnekî û ev çend salan de, rojnamegerîya kurdî li vir û li dera hanê ji hev qut nebûba, tê de valahî û dever çê nebûbana, lidûhevîya xwe parastiba, wê teqez rewşa wê baştirbûya û rojnamegerîya kurdî jî bi giştî wê ew çendî virnî neketibana. (Yiğit 2018:18)

Bajarê Stenbolê, paytexta dewleta Osmanî navendeke pir rengîn e. Ji bo edebîyata gelek neteweyên wek cihû, ermen, tirk û kurdan navendî kiriye. (Çakar 2011:140) Piranîya rewşenbîran xwe li Stenbolê girtine. Yek ji wan jî pêşengê fikra edebîyata modern a kurdî Hecî Qadirê Koyî (1815-1897) ye. Ew di gelek berhemên kurdî da wek mamosteyê zarokên Mîr Bedixan ku damezrînerên rojnamegerî û edebîyata modern a kurdî ne, hatîye nîşandan. (Kanî 2019:5)

Di jimara sêyem a rojnameya Kurdistanê da, li ser wefata Hecî Qadirê Koyî, helbesteke wî ya li ser rojnamegerî û edebîyata modern heye:

“Zemane resmî caranî nemawe/Çiraxî nazim û munşî kujawe

Le dewrî ême **roman** û **cerîde**/Eger çi meqsed e zanînî bawe.” (Kurdistan 2018:34)

Destpêka edebîyata modern a kurdî, heta demek nêzîk jî bi çîroka Fuad Temo ya ku di kovara Rojî Kurd (1913) da hatibû çapkirin, dihat destpêkirin. (Cewerî 2003:34) Cewerî di berdewamîya vê mijarê da wiha nivîsîye: “Gava mirov dîroka hunera çîrokê li ber çavan digire û çîroka vê antolojîyê ya pêşî digihîne sala 1856an, rehetî û aramîyek bi mirov ra çêdibe. Lê ez nikarim bibêjim ku hemû çîrokên vê antolojîyê li gora pîvanên çîroka hunerî ne. Di vê antolojîyê da çîrokên pir xurt, yên kêr xurt û yên lewaz jî hene. Ev antolojî ne antolojîya çîrokên bijarte, lê antolojîya çîrokên kurdî bi giştî ye.” (Cewerî 2003:38)

Mebesta vê şîroveyê ew e ku çîroka pêşî ya kurdî ne ya Fuad Temo ya ku bi navê “çîrok” çap bûye, lê paşê Mehmûd Lewendî navê “Şewêş” lê kiriye, ye. Çîroka pêşî ya kurdî ji alîyê Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867) ve hatiye nivîsîn. Navê çîrokê jî “Çîroka Mem û Zîn” e. Nivîskar jî dîyar kirîye ku çîroka xwe li ser Mem û Zîna Ehmedê Xanî hûnandîye. Ji xwe Ehmedê Xanî jî di mesnewîya xwe da dîyar dike ku wî bingeha berhema xwe li ser çîroka folklorî ya evîna “Mem û Zînê” avakirîye. Bi awayê ku evîna Mem û Zînê, ji bo fikra xwe vebêje ji xwe ra kiriye bahane, vê berdewamîyê nîşandaye. Bazîdî yek ji rewşenbîrên kurd e ku gelek berhemên wî di sedsala nozdehan da hatine çapkirin. Destpêka çîroknûsîya kurdî (1856) bi saya rewşenbîrên wisa ketiye pêşîya çîroknûsîya Tirkî (1870). Lê mixabin romana yeke a kurdî, şêst sal piştî derketina romana Tirkî (1875), bi romana “Şivanê Kurmanca” (1935) ya Ereb Şemo gihîşt xwendevanên kurdî.

Li ser destpêka edebîyata kurdî gelek çavkanîyên cuda cuda, wek antolojî û pirtûkê dersan ku edebîyatnasên kurd bi derfetên xwe yên taybet pêk anîne hene. Bêdewletbûna kurdan û bêpalpiştîya dewletê li hêlek bihêlin. Heta roja me ya îro jî li piraniya welatê kurdan hê jî perwerdeya bi kurdî qedexe ye. Mehmed Uzun di antolojîya Edebîyata Kurdî da wiha dinivîse: “Herwekî ku tê zanîn, daxuyanîyên sîyasî û edebîyatê zêde li hev nayên û ev celeb îzeh û daxuyanî edebîyatê dewlemendtir nakin. Lê mixabin ku ez jî divêm bi daxuyanîyek sîyasî dest bi vê kurtelêgera edebî bikim. Ji ber ku çaxa mirov bixwaze behsa ziman û edebîyata kurdî bike, bivê nevê, berî her tiştî, mirov bêgav e ku li ser rewşa sîyasî ya welatê Kurdistanê jî raweste. Li Kurdistanê, her tişt, edebîyat jî tê de, bi sîyasetê û jîyana civakê ve girêdayî ye.” (Uzun 2003:16)

Di vî warî de, yanî li ser edebîyata modern a kurdî Uzun, wiha didomîne: “Gelek dijwar e ku mirov bikaribe, li ser vê babetê, bergê û tabloyeke temam û yekgirtî bîne pê. Ji ber ku parçebûna welêt, dijwarî û zehmetîyên ku doralfiyên ziman û edebîyata kurdî rapêçane, hem rê li pêşketina ziman û edebîyatê girtine hem jî rê li yekîtiya wan girtine. Ji lewre,

edebîyata kurdî tu carî yekîtiya xwe neanî pê û li ser şopekî neherikî. Tixûbên ku di ser dilê welêt re hatine rakêşandin, di heman demê de, edebîyata kurdî jî parçe kiriye û rê daye ku her parçe bi alîyekî de here. (Uzun 2003:36)

Bi rastî li gor nirxandina nivîskarên ku li jêrê tê pêşkêş kirin (wek edebîyatek baş û payebilin), dîtin û nirxandina Uzunî hinek reşbîn e.

Dîsa li ser vê mijarê, di pirtûka dersê da ya bi navê “edebîyata kurdî (kurmançî)” ku ji alîyê komek nivîskarên kurd ve hatîye amadekirin, wiha dinivîse: “Li ser edebîyata nûjen em çî û çawa bibêjin jî, em ê nikaribin wêneyekî bi hemû rengan rast destnîşan bikin. Ev ji ber rewşa me kurdan û Kurdistanê ye. Edebîyata kurdî ji ber gelek sedeman di nava gelê kurd de bi têra xwe belav nebûye. Em dikarin bibêjin ku ew hertim di nava kesên zana û rewşenbîr de maye. Lê tevî tunebûna dibistan, dezgeh û dewleteke serbixwe, dîsa jî ew edebîyata ku îro di nava kurdan de heye, edebîyateke baş û bi pîvanên bilind e.” (Çiftçî 2019:84)

Hem rojnamegerîya Kurdî hem jî edebîyata modern a kurdî li piranîya welatê kurdan hê jî bêxwedî ye, bi gelek qedexeyên astengîyan ra rû bi rû ye. Bi tevî vî awayî jî di nava rojnamegerî û edebîyata modern a cîhanê da xwedî asteke hêja ye.

ENCAM

Di dawîya vê gotarê da em karin bibêjin ku bi berawirdkirina rojnamegerî û edebîyata modern a kurdî û Tirkî, encamên li jêrê derketin holê.

- 1- Her du destpêkan jî bingeha xwe ji geşedanên siruştî yên civakê bêtir ji dînamîkên derve ku bandor li ser rewşenbîrên her du civakan kiriye, girtîye.
- 2- Rojnamegerî û edebîyata modern a Tirkî bi piştgirîya dewletê dest pê kiriye. Lê ya Kurdî bi astengî û qedexeyên dewletê ra rû bi rû maye. Ev qedexeyên astengî ji destpêkê heta roja me ya îro hê jî li piranîya welatê kurdan didomin.
- 3- Di destpêka rojnamegerî û edebîyata modern a her du alîyan da jî berhem bes di nava rewşenbîran da belav dibûn.

ÇAVKANÎ

Anderson, Benedict, *Hayali Cemaatler MİLLİYETÇİLİĞİN KÖKENLERİ VE YAYILMASI*, Metis Yayınları, İstanbul, 2017

Cewerî, Firat, *Antolojiya çîrokên kurdî I (1856-2003)*, Amadekar: Firat Cewerî, Weşanên Nûdem, Stenbol 2003

Çakar, M. Sait-Fehim Işık-Mehmet Mehmetoğlu-Ronayî Önen-Esra Sadıkoğlu-Sami Tan, *Orta Öğretim KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI Ders Kitabı*, Tarih Vakfı Yayını, İstanbul 2011

Çiftçî, Ali-J. Îhsan Espar-Mahmûd Lewendî-Hesenê Metê-Amed Tîgrîs, *edebîyata kurdî (kurmançî) pirtûka dersê*, Weşanên Apec, Stockholm 2019

Hassanpour, Amir, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, Weşanên Avesta, İstanbul 2005

Jusdanis, Gregory, *GECİKMIŞ MODERNLİK ve ESTETİK KÜLTÜR Milli Edebiyatın İcat Edilişi*, Metis Yayınları, İstanbul 1998

Kanî, Ahmed, *Analîzek li ser ROJNAMEYA KURDISTANÊ 1898-1902*, Weşanên Apec, Stockholm 2019

Kaya, Fetullah, *Kürt Basını*, Weşanên Hîvda, İstanbul 2010

Kurdistan (1898-1902), Hemû Hejmar (01-31), Çapa Taybet, Weşanên J&Jyê, Amed 2018

Malmîsanij, *İlk Kürt Gazetesi KURDISTAN'ı Yayımlayan Abdurrahman Brdirhan 1868-1936*, Weşanên Vate, İstanbul 2011

Tanpınar, Ahmet Hamdi, *ON DOKUZUNCU ASIR TÜRK EDEBİYATI TARİHİ*, Dergâh Yayınları, İstanbul 2018

Uzun. Mehmed, *ANTOLOJÎYA EDEBÎYATA KURDÎ*, Weşanên Aram, Stenbol 2003

Yiğit, Mîrhem, *DÎROKA ROJNAMEGERÎYA KURDÎ -I-*, Weşanên J&Jyê, Amed 2018